Socialstyrelsen

# Serwîsa Sosyalê ji bo qenci-ya zarokan dixebite

## Agehî bo dêbavan



## Gelek malbat ji Serwîsa Sosyalê alîkariyê werdigirin

Serwîsa Sosyalê li hemû şaredariyan heye. Li van şaredariyan sosyonomên xwedî zanebûnên taybet hene, ku ji bo cîbicîkirina pêwîstiyên zarokan dixebitin, ku zarok hemû bi ewletî mazin bibin. Li rastiyê, ev jib o wan malbatan e ku yên dehfbûyî ne, yan ew malbatên ku ji hêla rûhî ve xwe baş nabînin, yan jî xwedî adeta bedbikarhanînekê ne. Serwîsa Sosyalê her wisa jî wan zarok û dêbavên ku rast li zor û kotekê hatibin, diparêze.

## Divê berî her tiştî rewşa li nav malê baştir be

Serwîsa Sosyalê dikare bi gelek awayan bibe alîkar. A normal ew e ku mirov bizane kîjan piştgirî ji bo malbatê ya herî baş e. Ew malbatên ku li nav mala wan pir pevçûn zêde çêdibin, ew dikarin wek nimûne herin cem yekê ku ji bo çareserkirina pirsgirêkan xwedî zanyariyan e û dikare ji bo van pirsan ji malbatan re bibe alîkar. Wek dêbav, mirov dikare ku ji bo baş bi cihhanîna karê xwe yê dêbaviyê, yan bi axiftina rûbirû, yan jî li nav grûbekê alîkarî ji Sosyalê werbigire. Ji bo zarokan jî, ev derfet heye ku yan kesekî ku jê re dibêjin kontaktperson peydakirin yan jî, bi zarokên xwedî heman rewşî bide û bistîne.

## Her kes dikare ji bo wergirtina piştgirî û parastinê daxwaz bike

Heger mirov bizane ku pêwîstiya mirov bi wergirtina piştgirî û parastinê heye, mirov bi xwe dikare behsa vê rewşa xwe ji Sosyalê re bike. Hem zaro û hem jî dêbav dikarin ji bo alîkarîwergirtinê pêwendî bi Sosyalê re bikin.

> Ji bo pêwendîkirina bi Sosyalê, here buroya Sosyalê ya li şaredariya xwe. Li malpera şaredariyê, hem jimareya telefona Sosyalê û hem jî ji bo pêwendîkirinê agehiya riya awayên din heye.

## Kesên bi tirs û taswas dikarin giliya xwe li nik Sosyalê bikin

Her kesê ku guman dike ku belku rewşa zarokekî nebaş e, dikare ji Sosyalê re bêje. Gilîkirineke li Sosyalê nayê wê wateyê ku mirov giliya dêbavekî dike, lê mirov gilî û taswasa xwe ya li ser zarokê dike. Heger

personelên li zarokxanê, personelê li dibistanê guman bikin ku rewşa zarokek nebaş e, li gor qanûnê erka ser şanê wan e ku ew vê yekê li nik Sosyalê gilî bikin.

> Mirov giliya xwe yekser li nik Sosyalê dike. Heger te divê tu tenê pirsekê li ser rewşa zarokekî bikî, tu dikarî bêyî ku navê zarok bidî, bipeyivî.

## Paşê çi dibe?

Heger Sosyal biryar bide ku zarokek pêwîstî bi parastin û piştgiriyê heye, hinge ev karê Sosyalê ye, ku ew biryara ku çi ji bo zarok û malbatê baş e bide. Ji vê re dibêjin 'utreda barnets situation', anku Sosyal li ser rewşa zarokî lêdikole. Hem dêbav û hem jî zarok dikarin beşdarê vê lêkolînê bibin û her kes dikare dîtina xwe bêje. Sosyal her wisa dikare bi kesên din re jî, yên ku zarok dinasin, li ser vê rewşê bipeyive, her wisa Sosyal dikare bi kesên din ên wek xizm û mamosteyên zarokî re jî bipeyive.

## Sosyal dikare çi bêje û nebêje?

Her kesê ku têkiliya wan bi Sosyalê re dibe, gerek e bikaribin bawerî bi Sosyalê bînin ku agehiyên nasik gerek veşartî bimîne. Loma Sosyal xwedî berpirsiyariyeke mazin e ku vê agehiyê veşêre. Ji vê re dibêjin sekretess (sirveşartin). Wek weliyê zarok, piraniya caran mafê mirov heye ku hemû agehiyên derbareyê zarok mirov bizane. Lê heger bibe ku zarok pêrgî rîskeke giran were, hinge Sosyal nabe ku agehiya derbareyê zarok bide der. Zarok çend mazin bibe, ew çend dibe xwedîmaf ku bixwe biryara xwe bide. Loma zarokên mazin, ew biryarê didin ku hin agehiyên derbareyê wan ji bo weliyê wan were gotin yan na.

## Piştgirî tê kirin heger zarok nikaribe êdî li male bijî

Heger mana li malê ji bo zarok nebaş be, hingê dibe ku zarok ji bo çendemekê li deverekê were hewirandin. Wek nimûne zarok dikare li nik malbateke din were bi cihkirin ku jê re dibêjin 'familjehem' (hewirandina li nik malbetekê) yan jî, hewirandina bi sexbêrî (tedawî) yan jî hewirandina li grûpekê; 'boende (HVB). Li rewşeke welê, mafê dêbavan heye ji Sosyalê piştgiriyê wergirin. Wek nimûne mirov dikare ji Sosyalê alîkariya ji bo pêşxistina rola xwe ya dêbavbûnê wergire. Armanc ew e ku rewşa zarok çend bikaribe baştir bibe.

## Koll på soc – Ji bo zarokên mazin

Kollpasoc.se malperek e ya Sosyalê ye. Li wir agehiyên derbareyê Sosyalê hene û agehiyên Sosyal çawa dikare ji bo zarok û xortan alîkar be. Nivîsên li vê malperê bi swêdiya hêsan e û hemû li ser pirsên girîng ên zarokan e.

**www.kollpasoc.se**

Socialtjänsten arbetar för barns bästa, översättning till KURMANJI (artikelnummer 2016-8-13) kan laddas ner från Socialstyrelsens webbplats www.socialstyrelsen.se/publikationer

Socialstyrelsen

Foto Scandinav/Rebecca Wallin